

Şehîde nemir Dr. Sadiq Şerefkendî:

## "BILA CIWANÊN KURD - KEÇ û KUR - BAŞ BIZANIN KU JIYAN DI ÊXSÎRÎ û BINDESTIYÊ DE û BI SERŞORÎ û ŞERMIZARIYÊ VE ÇIÇAS BÊ QEDR û QÎMET E û DI HEMBER DE HILMIJÎNA HEWAYÊ PAQIJ YÊ AZADÎ û SERBILINDIYÊ ÇIÇAS XWEŞ û DILREVÎN E"

Bibîranîna sêzdehemîn salvegera  
şehîdkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî

Bi hinceta sêzdehemîn salvegera  
şehîdkirina rêberê nemir û qedirgiran Dr.  
Sadiq Şerefkendî û hevalên wî di  
Xwaringeha Mîkonosê ya Berlîna  
Almanyayê bi destên terorîstên hov yê  
Komara Îslamî ya Îranê û bi fermana  
rayedarên bilind yê vê rejîma Kurdkuj,  
demjimêr 11'ê pêşnivroya roja şemî, 26'ê  
Xermanana 1384 (17.09.2005)'an bi  
beşdariya Sekreterê Giştî, endamên  
Deftera Siyasî û Komîteya Navendî û  
hejmareke zaf ji Kadro û Pêşmergeyên  
PDK Îranê di yek ji binkeyên Deftera  
Siyasî ya PDK Îranê de li bajarê Koyê ya  
Kurdistanê Îraqê, rê û resmek hate  
lidarxistin û rêz ji bîranîna şehîde nemir  
Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî (Fetah  
Ebdulî, Humayûn Erdelan û Nûrî Dehkurdî)  
hate girtin.

Rê û resma han bi nişandan Slaydek ji  
xebata neteweyî û parek ji gotin û  
serpêhatiya wî rêberê leheng û mezin û  
rola wî di rêberîkirina PDK Îranê de dest  
pê kir. Piştî hevalê xebatkar Kekê  
**Teymûr Mistefayî**, endamê Deftera  
Siyasî yê PDK Îranê peyamek ji aliyê



Deftera Siyasî ve bi vê boneyê pêşkêş kir. Deqa vê peyamê di  
rûpelên 2-4 ya vê hejmara **Agirî** (24) de ketiye ber çavên we  
xwendevanên hêja.

Di doma rê û resmê de gelek parçe Helbest, Sirûd, Pexşan û  
berhemên hunerî yê taybet bi vê boneyê hatin pêşkêş kirin. Hêjayî  
gotinê ye ku rê û resma bibîranîna şehîdên nemir yê Berlînê  
demjimêr 12:45 dawî pê hat.

### Nerazîbûna Komara Îslamî dijî biryara Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî

Van rojane girîngirtin mijara siyasî  
ya rojeva cihanê pesendkirina  
biryarnameya Ajansa Vejena Etomê ya  
Navneteweyî der barê bernameya  
etomî ya Komara Îslamî a Îranê û  
helwestên vî welatî û serokên welatên  
din yê cihanê ye.

Di roja çarşemî, 28.09.2005'an de,  
komek ji hêzên Besîcî yê rejîmê, li  
hember Balyozxaneya welatê Bîrîtanya  
li Tehranê civiyan û rola dewleta  
Îngilîstanê di amadekirina  
biryarnameya mehûmkirina  
bernameya etomî ya Îranê di Rêxistina  
Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî  
nerazîbûn nişan dan. Rayedar û  
Medyayên Komara Îslamî gotin ku  
kesên beşdarî vê meşê Xwendekar  
bûn. Di halekê de ew Hêzên kirêgirtî yê  
Besîcî bûn. Wan gelek xisar û zirar  
gihandiye avahiya Balyozxaneyê.



Herwiha karbidestên  
Komara Îslamî ya Îranê  
li hember dengê erê yê  
welatê Hindistanê bi  
biryarnameya dijî Îranê  
li AVEN de lihevkirina  
şandina gazê ji Îranê  
bo Hindistanê  
sekinandiye.

#### Demokrasi, buha û piratîka wê

(Pişka 15)  
Kurmanç Hakkî

5

#### Dosya Etomî ya Îranê di rêya Konseya Ewlekariyê de

Azad Kurdî

6

#### Îran di bikaranîna Muxediratê de bû şampiyon!

Agirî

7

#### Roman û Ewropa (Beşa 4)

Wergeran: Emîr Şuaivend

9

BIRATÎ  
Adar Jiyan

10

### Bibîranîna sêzdehemîn salvegera şehîdên Berlînê li bajarên Kurdistanê Îranê û derveyî welat

Bo rêzgirtin ji sêzdehemîn salvegera bîranîna şehîdkirina rêberê  
mezin û navdarê Kurd, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî li Berlîna  
Almanya, li gelek bajarên Kurdistanê Îranê xebatên rêzgirtin ji vê  
rojê hatin lidarxistin. Li gelek welatên derve jî ew roje hate bibîranîn.

## Axavtina birêz Teymûr Mistefayî, endamê Deftera Siyasî yê PDK Îranê di rê û resma 26'ê Xermananê, salvegera terora Dr. Şerefkendî û hevalên wî

### Hevalên xweştivî!

#### Xûşk û birayên birêz!

Her wekî hûn haydarin 13 salan berî niha di 26'ê Xermanana 1371(17.09.1992)'an de, Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê Partiyê, Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê Partiyê li derveyî welat, Humayûn Erdelan, nûnerê partiyê li welatê Almanya û Nûrî Dêhkurdî, kesayetiye Çep yê Îranî û dostê qedîmî yê partiya me di xwaringeha Mîkonosê li bajarê Berlînê ketine ber êrîşa terorîstên Komara Îslamî û jiyana xwe ji dest dan. Ew ku ji beşdarîkirin di Kongireya 19'an ya Enternasyonala Sosyalîst vegeyabûn, tevî hejmarek ji endamên çend rêxistinên Îranî ji bo gotûbêj li ser rewşa Îranê li dewra hev kom bibûn, hatin teror kirin.

Dr. Sadiq di 21'ê Befranbara 1316(1937)'an de li gundê Terexe ya Bokanê ji dayîk bûye. Ji temenê zarokiyê de bavê xwe ji dest daye û xwedîkirina wî dikeve ser milê birayê wî yê mezin, Helbestvanê welatparêz yê neteweya me, **Mamosta Hejar**.

Piştî mala wan diçe bajarê Mehabadê û di qonaxên xwendinê de herdem yan pileya yekem dianî yan ji xwendekarên here zîrek yê bajar bû. Lîsansa Kîmyayê ji Xwendingeha Bilind li Tehranê wergirt û bû mamostayê Kîmyayê. Bi sedema kêrhatîbûna wî di sala 1351(1972)'an de, bi mifah wergirtin ji borsiya xwendinê ya Wezaretê Zanistê bo Firansayê hate şandin û piştî 4 salan man li wî welatî, Duxtoriya Kîmyaya Analîzê stand.

Di sala 1352(1973)'an de, li Parîsê mamostayê mezin Dr. Qasimlo dît û paş axavtin û basê û pejirandina bername û destûra partiye bû endamê PDK Îranê. Piştî vegeyaran ji Parîsê bû peywendiyê navbera Dr. Qasimlo tevî endamên kevn yê partiye.

Di meha Reşemeya sala 1358(1980)'an de bû Şewirmendê Komîteya Navendî û berpirsiyarê Komîteya Partiyê li Tehranê pê hate spartin. Di kongireya çarem bi

endamê Komîteya Navendî hate hilbijartin û di Pîlnoma (civîn) a havîna sala 1359(1981)'an ya Komîteya Navendî wekî endamê Deftera Siyasî hate hilbijartin û heta roja şehîdbûnê di posta endamê Deftera Siyasî û Cîgirê Sekreter û Sekreterê Giştî yê Partiyê de xebitî û piranî berpirsiyariya Komîsyonên Teşkilat(Rêxistin) û Ragihandina Partiyê di stûyê wî de bû. Di vî warî de bi lidarxistina kilasên siyasî ji bo Kadroyan û perwerdekirina kadroyên nivîskar di Radyo û Çapemeniyê de li elimandin û hînkirina Kadroyên Partiyê di rewşên dijwar yê jiyana çiya û xebata çekdarane de bandoreke zaf danî. Dr. Sadiq piştî şehîdê nemir Dr. Qasimlo, mezintirîn mamostayê elimandina kadroyên partiya me ya xebatkar e.

Dr. Sadiq mirovekî biwêr, xwedî şiyar, xwedî kiryar, mandînenas, rastbêj û aştxwaz bû. Dema ku em bîr ji derbazbûyîya wî mirovê leheng dikin û kiryarên wî dinirxînin, bi rastbêjî û bawerî bi xwe bûnek ku di wî rêberê xebatkar de, bi wê zaniyariya ku hebû, rêberê xwedî şiyar û leheng jê çêbibû. Wî di peyama xwe ya ku ji bo spas û pêzanîna bi hinceta hevderdî û hevzemî ya xelkê piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo de soz da û got:

**"Me biryara yekcarî daye ku hemû hêz û şiyana xwe di rêya Dr. Qasimlo de bikar bînin, yanî rêça xebata bêrawestiyar di rêya azadî, demokrasî û mafên mirovan de bikin, hetanî di wê rêyê de ku rêya sor ya şehîdan e yan em dê bi serkevin yan wekî şehîdên ezîze din yê me em dê serê xwe danên".**

Di vî soza xwe de çiqa rastbêj bû, li rex mamostayê xwe li Pîrlaşêzê bi serbilindî ve serê xwe dana.

Di doma parek ji vî peyamê de derheq xebata çekdarane dedibêje: "Heke me dest ji bo çekê bîriye,



bo berevanîkirin ji neteweya me ye, şer bi ser me de sepandine, em ji şer û xwînrijandinê vêzarin, çunkî em wateya şer baş dizanin, lewre em herdem li ser vê baweriyê bûne ku heta çê bibe doza Kurdistanê ji rêya aştxwazane ve bihê çareser kirin. Lê kevneperestên dûr ji mirovahî û mentiqê bi vî karê hov selimandin ku ji bo çareser kirina pîrsgirêkên Îranê çî rêyekê bi navê rêya aştxwazane nas nakin û di nav xwe û xelkê Îranê de tenê zordarî û tund û tûjiyê bi hakim dizanin û bes!"

Her wekî Dr. Seîdê şehîd dibêje ku Komara Îslamî bo çareser kirina pîrsgirêkan ji bilî tund û tûjiyê zîmaneke din nazanin, ew li ser vê baweriyê bûn ku bi terora rêberên Partiya Demokrat dê karibin vê partiye hilweşînin. Lewre di destpêkê de di 22'ê Pûşpera sala 1368(13.07.1989)'an de Dr. Qasimlo li ser maseya bi nav gotûbêjê teror kirin. Rejîmê demekê dît bi şehîdbûna Dr. Qasimlo, Partiya Demokrat di bin birêveberiya Dr. Seîdê nemir de rêbaza xwe ya pîroz didomand, Refsencanî di civîna Konseya Ewlekariya Neteweyî ya Îranê ragihand, ew bi şehîd kirina Dr. Qasimlo bi meremên xwe negihîştin, lewre divêt di fikra rêyêke din de bin. Rêya wan bû eva ku bername terora Dr. Seîd darêjin û mixabin wekî di destpêkê de min îşare pê kir, di 26'ê Xermanana 1371(17.09.1992)'an de bername terore birêve birin.

Piştî vî cinayetê dezgeha Ewlekari û Dadê ya Almanyayê komek gumanlêkirî girtin û kişandine dadgehê.

Di doma birêveçûna dadgehê de Îranê gelek hewl da pêvajoya

dadgehîkirinê carekê bi geflêkirin ji Dadveran, carekê bi givaşxistin bo ser dewleta Almanyayê û carekê bi rehîngirtina malbatên terorîstên girtî li Lubnanê ji hêla Hizbulaha Lubnanê bigorîne. Lê hemû ew hewildanên wan bi sedema şahidîdana Benî Sedr, Serok Komarê berê yê Îranê û Ebulqasim Misbah, karmendê payebilind yê Wawak(dezgeha sîxor û ajanê ya Komara Îslamî ya Îranê) û îtiraf kirina terorîstan piştî domkirina 5 salan pêvajoya dadgehê bê encam man. Aqîbet Dozgerê Almaniya di daxwaznameya 12'ê Novembara 1996'an de ku sê rojan dom kir, Komîteya taybet ya terorê ku pêkhatibû ji: Rêber, Serok Komar(Refsencanî), Wezîrê Derve(Welayetî), Wezîrê Hundir û Wezîrê Îtîlaatê(Felahiyan)bûn, wekî birêvebirên vê kiriyara terorîstî bi dinyayê nasand û bi vî awayî careke din diholra şermezarbûna Komara Îslamî hate lêdan.

Di rastî de şanoya hîlbijartina gera nehem ya Serok Komariyê qadeke din ya rû bi rû bûna xelkê û rejîmê bû. Ji aliyekê desthilatê bo meşrû nîşandana rejîmê û beşdariya xelkê di vê hîlbijartinê de dest da fênd û fêlên cur bi cur, berbijaran bi dana sozên ne bicî wekî bexşîna dirav(pare), cî bi cî kirina gelaleya 15 madeyî ya Reformxwazên Kurd, dana sozên pile û payeyan bi kesên desthilathez û zaf sozên din yên bê navêrok, hewla rakîşandina herçiqas pitir ya xelkê bo ser sindoqên dengdanê da, heya ji raya giştî ya cîhanê re wisan bide xuya kirin ku hêştî di nav xelkê de cî û hitbar heye û rejîma wan meşrû e. Ji aliyê din opozîsyona Îranê bona vê çendê ku ji cîhanê re bidin xuya kirin ku ev rejîme di nav xelkê de ne xwediyê çî cî û paygahê ye û hîlbijartin di pergala Welayeta Feqîh de ji billî girtina jêsteke bê bîngeh ya demokratîk, tu wateyek nîne û tu bidestxistinek ji bo civatên xelkê û welat di şûn de nabe, daxwaz ji xelkê kir di şanosaziya hîlbijartinê de pişikdar nebin û baykot bikin.

Encama vê hîlbijartinê bi desttêxistinek zaf ku tê de hate kirin û heta Kerûbî û Refsencanî dengê nerazîbûna xwe seba wan xilafkariyan bilind kirin, serbarê vî halî jî hejmareke zaf kêr ji xelkê di hîlbijartinê de pişikdarî kir.

Xelkê Kurdistanê jî bi pêşwaziya bangewaza baykotê derketin û kêmtirîn radeya hîlbijartinê di Îranê de, li sê parêzgehên Kurdan yanî:



**Kurdistan, Azerbaycana Rojava û Kirmaşanê** de hate kirin. Bi vî awayî xelkê Kurdistanê bi gotina **NE**yeke din bi rejîmê, vêzariya xwe ji vî rejîmê dane xuya kirin.

Piştî vê şanosaziyê Mehmûd Ehmedînejad ku yek ji kesên herî kevneperest û paremayî yê heliyayî di Welayetê de, bi awayekî ne çavnihêr kirî bû Serok Komarê rejîmê û bi vî awayî hewl û xebata rejîmê ji bo yekdest kirina xwe û bi ser kar anîna kesekî paşverû benî gihiştê encamê.

Dewleta Ehmedînejad, dewleteke ewlekar û leşkerî ye. Bo mînak Wezîrê Çandê yê vî dewletê, kesek bi navê Mihemed Husên Sefarmend e ku berê Cîgirê Sipaha nawçeya 6 ya welat û berpirsiyarê Deftera Siyasî ya Sipahê û xwedî û sernivîskarê rojnameya radîkal û tundra ya **Keyhanê** bûye. Ev Wezîrê yek ji kesên herî dijber û neyarê demokrasiyê ye, navhatî hevalekî nêzîk yê Şerîetmedarî, berpirsiyarê niha yê rojnameya Keyhanê ye ku bi tevahî di welayetê de heliya ye. Ji aliyê Ekber Gencî ve di pêwendî tevî kuştinên rêzokî de hatiye sûçdar kirin. Bi hebûna navhatî di vî berpirsiyariyê de, divêt çî çarenûsek li benda çapemenî, sînema û muzîka Îranê be.

Yan anîna kesek wek Muhsin Êjeyî ku Melayekî radîkal e û ji murîdên Ayetula Misbahê Yezdî ye. Di posta Wezareta Îtîlaatê de, divêt çî rojên dijwar û tarî li benda xebatkarên siyasî de be. Bê guman ew hevtayekî bêhempa yê Elî Felahiyan e.

Heke bi ser kar anîna dewleta pitir leşkerî û ewlekar ya Ehmedînejad bo berevanîkirin li hember her êrîşekê ku bo ser rejîma Îslamî derkeve holê, lê dikeve û di vî çarçoveyê de bikaranîna tund û tûjî, serkut û çewisandina xelkê û bînpêkirina maf û azadiyan di şûn de tê, ji aliyê din jî bê guman yekdestî û hevgerîna xelkê dijî rejîmê li pey tê ku mînak serhildana vî dawiyê ya xelkê Kurdistanê bû.

Tevî diyarîkirina Ehmedînejad bo Serok Komariyê, hêzên rejîmê li hemû bajarên Kurdistanê bi dijî xelkê ketine meşandina tund û tûjiyê, hetanî ku di 18'ê Pûşperê, hêzên rejîmê li bajarê Mehabadê ciwanekî Kurd bi navê Şiwane Qadirî bi awayekî hovane şehîd kir û awayê şehîdkirina wî ciwanî heta bêhurmetî û sivikatîkirina bi termê wî bû sedema xuyakirina nerazîbûna xelkê vî bajarî dijî rejîmê. Xuyakirina nerazîbûna xelkê Mehabadê di 22'ê Pûşperê, salvegera şehîdkirina Dr. Qasimloyê nemir bi daxistina hemû dukanên vî bajarî, awayekî din ji nerazîbûna medenî bû.

Ciwanên bajarê Mehabadê bi qîrandina dirûsmên **Qasimlo, Qasimlo rêya te dirêji heye**, xuya kirin ku nerazîbûn li hember kuştina wî ciwanî tenê destpêka meşeke berfirehtir û anîne rojeva daxwaz û xwastikên wan e ku di dirûşma **Qasimlo, Qasimlo rêya te dirêji heye** xwe nîşan dida. Xelkê bajarên din yên Kurdistanê jî bo piştgirî ji daxwaz û xwastikên xelkê Mehabadê dijî cinayetên rejîmê dest dane nerazîbûnên medenî û ev xwepêşandane pitir ji mehekê dom kirin.

Rejîmê û hin aliyên ne berpirsiyar gelek hewil dan xwenîşandanan ji rêya rast derxin, hêzên "Besîcî" yên rejîmê li bajarê Sine, agir berdane "Pasaja Hemîd" û xwestin wisan bidin xuya kirin ku ev nerazîbûne bê armanc in. Li bajarê Seqizê jî agir berdane "Husêyniyê"( Mizgefta olî ya Şîyan) wan armanc ji wan agirberdanane çandina toyê dijminatî û dijberiyê di nav neteweya me de bû ku gelek zû ji aliyê PDK Îranê ve, ew du hereketên rejîmê hatin mehkûm û şermezar kirin.

Armanca din ya rejîmê ji wan karane kişandina xwenîşandan ber bi tund û tûjiyê bû, bona vê çendê ku rêya qirkirin û kuştinê xweş bikin û eva di kiryarê de tevî kiryar û piropagendeya hin aliyên

ne berpisiyar ku teblîxa tund û tûjiyê dikirin, hev digre. Mixabin ew awayê piropagendeyê û hewlên rejîmê ji bo kişandina meş û xwenîşandanan bo van aliyanê bû sedema serkuta bêrehmane li çend bajarên Kurdistanê û dehan şehîd û birîndar lê ket û sedan kes ji xelkê Kurdistanê ku piraniya wan ciwanên xebatkar bûn, ketine girtîgehan û li ber azar û îşkenceyên hovane yên kevneperestên desthilatdar û heta niha jî hejmareke berbiçav ji wan ciwanên xwedî hest û şoreşvan di girtîgehê de, di bin azar û îşkenceyê de mane. Li gorî serhejmariya para Dadê ya Azerbaycana Rojava, tenê di vê Parêzgehê de 149 kes hêsta di girtîgehê de ne. Di Parêzgehên din jî bi sedan kes di girtîgehan de mane ku di cihê xwe de ye li wir em tevî her bijîn gotin ji berxwedaniya tev girtiyên xebatkar, her bijî û silaveke taybetî jî ji bo Seîd Saidî û Îclal Qewamî, du rojnamevanên biwêr û egîd bişînin ku li dijî rewşa girtîgehê û awayê livîn û rîftara zîndanvanan tevî girtiyên, gireva birçibûnê girtin. Girevgirtinek ku ji 22'ê Gelawêjê ve dest pê kiriye.

Pêvajoya girtina ciwanan li bajar û gundên Kurdistanê her didome û rûj nine ku hêzên rejîmê bêwext neçine malên xelkê û piştî nerihetî û azardana malbatan, evladên wan rapêçî girtîgehên rejîmê neken.

Ji xasmaniyên vê xebata gelî:

-Hevgirtin û hevrefiya xortên neteweya me ji Bakûr heta Başûrê Kurdistana Îranê

-Serhildana asta bilind ya bîr û ramana neteweyî di nav neteweya me de

- Ceribandina awayeke din ya xebata gelî dijî desthilata tevîxwaz

- Anîne rojeva dubare ya daxwaz û xwestikên neteweyî

- Dengvedana vê xebata gelî di kom, civîn, medya û ragihandina hundir, herêm û navneteweyî

- Serbarê têgihîştin ji vê rastiyê ku rejîmê taba nerazîbûn û rexneya xelkê nake, her xwenîşandaneke dijî rejîmê kuştin, birîndar bûn û girtinê di şûn de dibe, meşandina wan xwenîşandananê di asteke berfireh de nîşana bê tirsî û stûxwar nekirina neteweya me ye.

Herçiqas wan xwepêşandananê di asta navneteweyî û Îranê de li gor mezinahî û bêmînakiya nerazîbûne dengvedan nebû, lê dîsa îşare kirin bi helwesta Wezareta Karê Derve ya Amerîka derheq nerazîbûn dijî

serkuta xelkê û nameya bedew ya Menûçêhr Mihemedî, xebatkarê netirs û navdar yê Îranê ku rû ji dayik û bavê xwe dike û dibêje: "Niha 28'mîn roja girevgirtina min ya birçibûnê ye, daxwazê ji we dikin bedela piştgirî kirin ji min, piştevaniyê ji daxwaz û xwestikên xelkê serhildayî yê Kurdistanê ji bo azadiyê bikin. Behî û serexweşiyê ji neteweya Kurd û Partiya Demokrat seba şehîdên vê xwenîşandaneke dike".

Piştî vê rûdanê rejîmê bi awayekî serweyî û derew, bo vekolîn ji çawaniya qewimîna ew meş û nerazîbûnane, çend şand ji bo Kurdistanê hinartin, heta bi dîtina xwe ku xwegêjkirin ji pirsgirêka Kurdistanê ye, bihewilîne wisan bide xuya kirin ku xwenîşandananê xelkê Kurdistanê dijî çend rayedaran e ku baş nexebitîne. Lê hemû carê tevî bersiva ron û wêrane ya xelkê Kurdistanê rû bi rû bû û rejîm di vê hewla gemar ya xwe de ne serkevt.

Di yek ji wan civînan tevî xelkê de, kurekî netirs û xebatkar yê neteweyî wiha tê axavtinê:

"Gelî birêzan, demekê em dibînin yan dibihîsin di qonaxek ji demê de dirûşma xelkê û opozîsyon (Partî û rêxistinên siyasî yên bi dîtina wan ne qanûnî) a Kurd hevdigre, we pê ecêb nabe, çûnkî ev opozîsyone ne Amerîka û ne Ewropa ji me re şandiye. Ew xortên vî welatî ne û ji nav dilê vê civakê de hilketine. Bîrîkirin ji bilî vê çendê şaş e, heke hûn difikirin ku bi dîrxistina opozîsyona Kurdistanê ji meydana bûyeran karekê dê pêş de bibin, hûn ji rêyeke şaş re çûne. Dîrxistina wan ne tenê nabe sedema aramî û ewleyiyê, belkî pirsgirêkê aloztir dike. Pêşniyara min eva ye ku hûn werin û tevî opozîsyona Kurd li ser maseya gotûbêjê birûnin ku eva gelek çaresaz dibe".

Eva bersivê e ku divêt rejîmê bi xwe ji kakila bûyeran zanîba û xwegêjkirin çî ji bingeha pirsê naguherîne. Eva gotina hemû xelkê vî neteweyî ye.

Pirsa bidestxistina çekên etomî ku eva demek e Îran bi dizî ve xebatê bo dimeşîne û di wan salên dawiyê de lê eşkere bûye, ji bo rejîmê bûye pirseke heysiyetî û heta şiklê neteweyî jî pê daye û li ser destpêkirin û çalakkirina navendên dewlemendkirina

Uraniyûmê pêdîçeçîne.

Rejîm dibêje armanca wan jî zengînkirina teknolojiya Etomî, ne bidestxistina çeka Etomî ye. Heke em balê bidine karnameya derbazbûyîya Îranê, derdikeve ku ji bilî derew, fêl û xapandinê nebe, tu tiştêkê ji civaka navneteweyî re pêşkêş nekiriye.

Berpirsiyarên rejîmê her carê tiştêkê dibêjin û piştî gotinên xwe bi awayekî din dixebitin. Lewre Rojava jî li ser sekinandina hemû cure dewlemendkirinekê ji hêla Îranê tekezê dike û baweriya wan bi Îranê nemaye.

Di van rojane de dosya Îranê di Rêxistina Enerjiya Etomî dikeve ber bas û egera şandina perwendeya Etomî ya Îranê bo Konseya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî heye û renga biryareke gunehbarkirinê ya Konseya Ewlekariyê ya RNY li ser Îranê di şûn de be.

Tevahiya van bûyerane me tîne ser vê baweriyê ku welatê Îranê di pêşerojêkê nêzik de diçe nav qonaxek nû, ji bo rû bi rû bûn tevî vê qonaxa nû, hewce ye hêzên opozîsyon û demokratxwaz bi giştî û nemaze hêzên siyasî yên neteweyên Îranê, refên xwe ji bo berevrû bûn tevî egerên pêşîn hevgirtî bikin. Bê guman divêt rol û bandora PDK ji pêkanîna vê hevrefî û hevahengiyê de rolekî berbiçavtir ji caran be û ji bo vê meremê bi avêtina gavên jêhatî û bîr û fikra hûr, divêt em di asta bilind vî qonaxî de bin.

Di vê boneyê de, di salvegera şehîdkirina rêberê jêhatî û gernas yê Partiya me, Dr. Sadiq Şerefkendî, em bo careke din rêz û hurmetê ji xebat û tekoşîna şehîdên Mîkonosê digrin û sozê bi wan re nû dikin ku heya bidestveanîna hêvî û armancên neteweya me, em dê xebat û tekoşînê bidomînin.

Herwiha tevî behî û serexweşî ji malbatên şehîdên vê dawiyê yên meşên nerazîbûna xelkê Kurdistanê, em hêviya başbûnê ji birîndaran re û azadî ji girtiyên siyasî re dixwazin.

**Bihiloşe rejîma Komara Îslamî.**

**Serkeve xebata neteweya Kurd Bi rêberiya PDK Îranê.**

**Hûn jî serkevtî bin.**

# Demokrasî, buha û piratîka wê

(Pişka 15)

Kurmanç Hakkî  
kurmanchakki@yahoo.com

## Hinek rexne li ser şiroveyên sade ya yeksaniya ramiyarî

Me di hejmara berê de basa teoriya yeksaniya ramiyarî ji mêzegeha Dahl kir. Di vê beşê de em dê dirêjiya mijarê li ser rexneyên ku ji vê teoriyê tîn girtin rawestin:

Girifta berçav ya teoriya Dahl şirovekirina wî li ser yeksaniya ramiyarî ye, ku li gor wî divêt jibîr û ramanên siyasî yên welatiyan re giraniyek wekhev di biryarên siyasî de bê dan. Siyasetvan Çarlz Bêytz navê teoriya Dahl daniye **şiroveya sade ya yeksaniya ramiyarî**. Li gor wê teoriyê (teoriya Dahl) merca yeksaniya siyasî ewa ye ku welatiyan bi awayekî wekhev mafê beşdarî di biryarên kollektîv de hebe.

Şiroveya sade ya wekheviya siyasî dê li çend mêzegehên bikeve ber rexneyan: Me di berê de basa giriftên hilibijarteya civakî dema ku divêt di navbera zêdeyî du alternatîvan de yek bê hilibijartin, kir. Bêytz bala xwe dide girifta şiroveya yeksaniya siyasî di mêzegeha tengeja hilibijartina civakî de. Tenê şêwaza dengdanê bi awayên cur bi cur tîn şirove kirin. Bo nimûne merca dengdana bi nepenî bo hilibijartina prêfirênsa mirov wekheviya şûndanîna civakî ya wana ye, bê berçav girtina nasnameya berendamî (kandîdên hilibijartinê).

Bêytz şiroveya wekheviya siyasî di gel şiroveya wekheviya aborî berhev didet. Li gor şiroveya sade ya wekheviya siyasî, mirov mafê wekhev heye ji bo şûndanîna li ser biryarên siyasî. Ew şirovekirinê mirov dikare di gel wan teoriyên aborî berhev bide ku li gor wan: Her kesê diviya hertim û bê berçav girtina kar û cihê civakî yê wana dahatên wekhev hebe. Bi wê dîtîne divêt mirovan hertim mafê wekhev di biryardanên kollektîv de hebe. Li gor Bêytz ew cure şirove kirinane gelek sakarane ne.

Eger daxwaz li ser wekheviya welatiyan di biryarên siyasî de be, di gel metodên hilibijartina civakî diviya piroseyên acêndeya (bas/bername) siyasî jî bi awayekî wekhev bê şirove kirin.

Acêndeya siyasî bi wateya pirsyarên pêwendîdar bi bername yan biryara siyasî ye ku ji bo bersîvdana her yek ji van pirsane metodên cur bi cur bi kar tînin. Bo nimûne Dahl li vê baweriyê ye ku divêt acêndeya pirsên siyasî û piroseyê biryardanê di dema dengdanê de wekhev be. Li gor Bêytz, ewa destpêkek baş, lê ne kemilî ye.

Bêytz wekheviya siyasî bi wê awayê berçav digire ku diyarîkirina acêndeya siyasî di rewşek îdeal de bibe û hemû welatiyan di pirsek taybetî de prêfirênsê wekhev hebe. Di wê rewşê de welatî hilibijarteya siyasî ya xwe li gor qazanc û berjewendiyên xwe ye. Yeksaniya siyasî di vî warî de dê demekê misoger biba, ger pirsê herî giring li gor welatiyan bê hilibijartin û bikeve ber dengdanê û welatiyan maf û giraniya wekhev hebin, bê berçav girtina nasname yan naveroka pîrefirênsa wan.

Merca yeksaniya siyasî ya sade ewa ye ku pirsgrîkên pêwendîdar bi dengdanê li gor hilibijarteyên welatiyan yên berê be. Her çawa be, ewa ne dîtineke realist di hilibijartina acêndeya siyasî de ye. Têgihîştin û dîtina takekesan li ser mijarên siyasî bi aliyê kêr beşek li ser bingeha gotûbêjên civakî û giştî tê pêk anîn. Di gotûbêjên civakî de takekes berjewendiyên xwe li gor rewşa civakî û dîtîna ramanên takekesên din hildibijêrin. Bo nimûne peyvîn li ser referandomê bo serxwebûn yan federaliyeta Kurdistanê girêdayî bi rewşa civakî, navneteweyî û asta amadeyiya partiyên xwedî rol di bizava neteweyî de ne. Di basa referandomê ji bo Kurdistanê her takek Kurd li gor rewşa siyasî, civakî û berjewendiyên xwe û li gor wan argûmentên ku di civakê de hene biryarê dide.

Şirovekirina rojeva siyasî basa yeksaniya ramiyarî gelek aloz dike. Li gor Bêytz hebûna prêfirênsa siyasî ya welatiyan encama pêwendiyên civakî û gotûbêjên hola pirsên rojevê ne. Li gor wî bi hebûna alternatîvan, welatî dikaribin bi hev re bikevin diyalogê, fêr bin û bîr bikin û hevdem jî dîtîna ramanên wan bihên guhartin. Ferz kirina wê yekê ku welatî bi destnîşan

kirina rojeva siyasî bikaribin bi awayekî wekhev prêfirênsên xwe hilibijêrin ne bese. Ji ber wê ye jî ku prêfirênsa siyasî ya welatiyan ji rojeva ramiyarî nayê cuda kirin. Bi vî awayî yeksaniya siyasî di biryardanan de pêwîst bi gotûbêjek kûrtir heye.

Di wê beşê de em dê kêmasiyên wekheviya siyasî ya sade ji mêzegeha normatîv û yasayî bidin ber lêkolînê: Dahl di teoriya xwe da basa wê yekê nake ku çî bîr û ramanên siyasî li biryardanên ku li ser bingeha dengê piraniyê ye bê berçav girtin û çî ji wan hizran bê wînda kirin. Her wek Dahl bi xwe jî bala xwe didetê, ewa yek ji giriftên demokrasiyê ye, ji ber ku gelek biryarên ku bi awayê demokratîk tîn dayîn dikaribin mafê kêmaniyan pêpes bikin. Ewa jî dibe hegera wê yekê ku mirov bîr bike ku demokrasî mafê kêmaniyan sinûrdar dike û her wek Dahl dibêje piraniya civakê wê demê bingehên demokrasiyê bin pê dîkin.

Di gel wê jî biryardanên bi awayê demokratîk bi hizra Dahl ne dijî bingehên demokrasiyê ne. Bi raya Dahl bo nimûne Dewletên Yekbûyî yên Amerîka ku tê de dadgeha bilind ya dewleta navendî û eyaletan mafê çawdêriyê li ser mafên destpêkî yê welatiyan heye, baştirîn nimûne nine. Bi hizra wî zêdebûna desthilata dadgehan dibe sebebê kêr bûna mafê welatiyan.

Kêmasiya mafê welatiyan ewa ku tê de tenê basa mafên destpêkî yê welatiyan kiriye. Bo nimûne mafê çapemenî, rêxistin û axaftinê. Di welatên Lîberal da ji bilî wan mafane mafê xwedîbûnê<sup>1</sup>, mafê serbestiya olî (ayînî), serbestiya wîjdanî û mafê parastina jiyana tekekesî hatiye misoger kirin. Ji wana mafê xwadîbûn û parastina jiyana takekesî ne ji wan mafane ne ku bi mafê demokratîk bê navdêr kirin. Lê mafê serbestiya ayînî û serbestiya wîjdanî mirov dikaribe bêje, mafên bingehîn yên demokratîk in. Ji ber ku mirov diviya otonomiya moralî (exlaqî) hebe hetanî bikaribe otonomiya bîr û raya derbirinê jî hebe.

Eger em qebûl bikin ku wekheviya sade di demokrasiyê de wekheviya civakî naîne, divêt em di şûn teoriyêke nû ji bo bersîva vê pirsê bikevin. Divêt hizra edaletxwazane ya demokrasiyê bi awayekî nû bê şirove kirin. Me hewce bi teoriyekê heye ku bikaribe hewcehiyên pêwîst bo hilibijartina prêfirênsa welatiyan di biryarên kollektîv de pêşkeş bike. Dîtina han di hejmara tê de em dê li teoriya Bêytz bigerên.

<sup>1</sup> حق مالکیت

# Dosya Etomî ya Îranê di rêya Konseya Ewlekariyê de

Azad Kurdî



Demeke dûr û dirêj bû ku gotûbêj, danûstandin û hewildanên dîplomasiyê der barê bernameya Etomî ya Îranê di navbera vî welatî û 3 welatên Almanya, Fransa û Îngilîstanê bi nûneriya Yekîtiya Ewropayê di rojeya siyasî de bû. Dosya Etomî ya Îranê di civînên çend rojên çûyî (19-24'ê Septembara 2005'an) yên Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî de kete rojevê. Bernameya Etomî ya Îranê mijara sereke ya vê gera civînên AVEN bû.

Aqibet êvarîya roja şemî 24'ê Septembara 2005'an, 3 welatên Ewropayê: Almanya, Fransa û Îngilîstanê pêşniyameya xwe ya amadekirî pêşkêşî Lijneya Rêveber ya Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî kirin û bi piraniya dangan hate pesend kirin.

Ji 35 welatên endam di Lijneya Rêveber ya AVEN de, 22 welatan dengê **Erê**, 12 welatan dengê **bêalî** (xwe ji dengdanê parastin) û tenê welatê Venezuelayê, ew jî bi sedema hebûna têkiliyên nebaş di navbera vî welatî û Amerîkayê dengê **Ne** da biryarnamê.

Di vê biryarnameya nû ku diji Îranê hatiye pesend kirin, hikûmeta Îslamî ya Îranê bi bînpêkirina peymana pêşgirtin ji pêşdebirina çekên Etomî ya Navneteweyî hatiye mehkûmkirin. Herwiha di biryarnameya Ajansê de hatiye ku bernameya etomî ya Îranê ji bo aştî û tenahiya cihanê bi xeter e. Lewre di biryarnamê

de hatiye gotin ku dosya Etomî ya Îranê divê bo Konseya Ewlekariyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bihê şandin. Ji ber ku Konseya Ewlekariyê berpirsiyariya parastina aştî û tenahiya cihanê heye.

Ev biryarnameya di rojên destpêka civînê de hatibû ber bas, lê tevî dijberiya hin welatan rû bi rû bû. Guhertina balkêş ya di naveroka biryarnamê de ku roja şemî, 24'ê vê mehê hate pejirandin, eva ye ku dema bilez ya şandina Dosya Etomî ya Îranê bo çaxê ne xuya hatiye diyarî kirin. Tê gotin ku di civîna pêşîn ya Lijneya Rêveber ya Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî de ku mehek û nîva din tê lidarxistin, dê biryara dawiyê li ser şandina Dosya Îranê bo Konseya Ewlekariyê ya NY bihê dayîn.

Biryara nû ya AVEN'ê rêya birîna Dosya Etomî ya Îranê bo Konseya Ewlekariyê ya UN'ê vekir



Di naveroka biryarnameya pejirandî de, Îran hatiye neçar kirin ku hemû xebatên xwe yê dewlemendkirina Uraniyûmê bide sekinandin. Rayedarên Îranê dibêjin ku bi çî awayekê ne amade ne ji helwestên xwe der barê zengînkirina Uraniyûmê û xebat ji bo berhevanîna çekên Etomî paşde bikişîne.

Bi salane ku karbidestên kevneperest û terorîst yê Komra Îslamî îdiaya vê çendê dikin ku bernameyên Etomî yê Îranê aştîxwazane ne. Lê raya giştî ya cihanê û nemaze Dewletên Yekbûyî yê Amerîka û welatên Ewropayê û ... guman û şik di armanc û xebatên etomî yê Komara Îslamî ya Îranê û bidestxistina çekên etomî ji hêla vî welatê paşverû û dîktator hene û vê pirsê bi gefeke xurt û mezin jî bo aştî û tenahiya cihanê dizanin.

Piştî vê biryara giring li ser Îranê di Lijneya Rêveber ya AVEN de, gelo diyalog û gotûbêjên dîplomasiyê li ser vê dozê dê berdewam bibin an na? Û gelek pirsên dinê ... . Bê guman armanc û meremên qirêj û dijî mirovane yê vê rejîma kevneperest jî her kesê re xuya ne. Yekîtiya Ewropayê ku di destpêkê de diji biryara Amerîkayê li ser şandina Doza Etomî ya Îranê ji bo Konseya Ewlekariyê ya NY bû, xebatên zaf yê dîplomasiyê bi Îranê re pêk anîn û ji wan re jî aşkira û xuya bû û rûçikê rastî yê armancên qirêj û gemar yê Komara Îslamî bo wan derkete holê. Ya rast eva ye ku Ewropayîyan tenê ji ber dan û standinên aborî û bazirganiya bi vê rejîma paşverû re heta vê demê tevî Komara Îslamî ya Îranê hewl û xebatên dîplomasiyê dimeşand. Renge di pêşerojê jî ew gotûbêj her bidomin. Lê ya girîng eva ye ku niha rêya şandina Dosya Etomî ya Îranê ji Konseya Ewlekariyê ya NY re hatiye vekirin.

Rojeya siyasî ya pêşiya me dema şandina Dosya Îranê ji hêla rêxistina AVEN'ê bo Konseya Ewlekariyê diyarî dike.

## Bandora fisada aborî li ser civaka Îranê

Fisada aborî mezintirîn asteng û arîşeya li ser rêya gihîştin bi pêşdeçûna aborî û civakî ya welat e. Ji ber vê ku yasayan dişewîne û herweha bingehên geşekirina aboriyê jî bêhez û lawaz dike.

Tesîr û bandorên fisada aborî, pêtir hevrîsê tex û qatên hejar û belengaz yê civakê dibin, ji ber wê çendê ku texên belengaz yên civakê piranî bi îmkanat û xizmetkariyên dewletî piştrast in û karîn û şiyana bihayên çavkanîgirtî ji bertîlwegirtin û parvekirina neadîlane ya îmtiyazên aborî ninin.

Fisad ew siyaset û bernamêyên ku armanca wan ji holê rakirina belengazî û hejariyê ye, ji nav dibe û bi şikestê re rû bi rû dike. Lewma divêt dewlet ji her terze kiriyarekê ku fisada aborî di hemû astên desthilatê de (bi taybet di astê serwe ya rayedar û karbidestên payebilind û derdorên wan de) ji nav dibe, xurttir bike û bi tundî li hemberî metodên cur bi cur yên fisada aborî weke hilatin ji dana maliyatê, qaçax û baziraganiyê û...



îmtiyazên taybetî yên aborî bi xizm, kes û karên rayedarên dewletî raweste heya ku delîve ji bo geşekirina aborî û civakî ya welat pêk bihêt.

Li gor rapora Rêxistina Navneteweyî ya Zelaliyê (şefafiyet), Komara Îslamî ya Îranê di warê asta berfirehî û xurtbûna fisada îdarî

de weke bertîlxwarin û gendeliyê û... di nava 146 welatên cîhanê de di rêza 57'ê de û di nava 12 welatên Rojhilata Navîn de piştî Îraq, Felestîn û Lubnanê de di rêza 4'an de cih digre.

Di vê raporê de qasê fisadê di welatên cur bi cur de bi hejmarên 0 hetanî 10 hatiye nîşandan, çiqas hejmara di vê navberê de zêdetir be, nîşana fisadê kêmtir e. Ev hejmare ji bo Îranê 2/9 hatiye nîşan dan.

Li gor vê raporê welatên Rojhilata Navîn mîna Îraqê rêza 17, felestîn 36, Lubnan 49, Îran 57, Mîritiyên Yekbûyî yên Erebi 117, Behreyn 113, Urdin 110, Qeter 109, Kuweyt 103, Erebiyên Seûdî 57, Sûriye jî rêza 74'an a cîhanê bi xwe girtin. Aherweha Uman jî paqijtirîn welatê Rojhilata Navîn di warê gendelî û bertîlxwarinê de hatiye destnîşan kirin û di rêza 118'an a cîhanê bi nimreya 6/2 hatiye cih dan.

## Îran di bikaranîna Muxediratê de bû şampiyon!



Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di rapora xwe ya dawiyê di sala 2005'an de, Îran li pileya yekem ya bikaranîna madeyên Muxediratê di cîhanê de, destnîşan kir. Serhejmariya RNY dibêje ku zêdetir ji 4 Milyon Mutadên madeyên bêhişker di Îrana 70 Milyon kesî de hene. Welatê Qirqizistanê bi navbereke gelek zaf ji Îranê re, di pileya duyem ya cîhanê de ye.

Lêkolîn didin kifşê ku sedemeke eslî ya bikaranîna zaf ya Muxediratê **bêkarî** ye. Bêkariyê peywendiyê rasterast bi vê nexweşî û pirsgirêka xurt ya civakî re

heye. Heşîş, Hiroyîn û Tiryak 3 cureyên Muxediratê ne ku niha li Îranê bi awayekî zaf û berfireh tînin bikar anîn. 8/2 ji sedê ya vê nifûsa ku mutad e ciwanên bin 15 saliyê pêk tînin. Vê pirsê rewşa jiyana civakî li Îranê xistiye ber tirs û nigeraniyê.

Li gorî agahiyên Radyoya "Farda" ya Farsî ziman di roja 24.09.2005'an de, rojnameya navdar ya **Washington Post**, parek zaf ji weşana xwe di roja îne 23.09.2005'an taybetî ji bo mijara zêdebûna ecêb û berfireh ya bikaranîna Mewadên Muxedir li Îranê terxan kiriye.

Rapora vê rojnameya bi nav û deng jî dibêje ku Îran li gor nifûsa xwe, pileya yekem ya cîhanê di hejmara wan kesên ku mewadên Muxedir bi kar tînin heye.

Sedemên zêdebûna berfireh ya vê pirsgirêka civakî li Îrana bin desthilatdariya reş û tarî û dijî mirovahiyê ya Komara Îslamî ye ku divêt bikeve ber lêkolîn û dahûrandinan. Em dê bihewilînin di hejmarên tê yên **Agirî** de li ser vê mijara girîng rawestin.

**Jêder:**

- **Radyo "Farda", roja 24.09.2005'an**  
- **Rojname etemad, çapa Tehranê**

## Li Bane keçek bi terzeke hovane bi destê bavê xwe hat kuştin

Di roja 31.06.1384

(22.06.2005)'an de, li gundê Tajebanî ya Bane Reuf Feqê Mehmûd keça xwe bi navê Sumeye bi sedema vê çendê ku razî nebûye tevî kesekê ku wî jêre diyarî kiriye bizewice, xiste bin Otombêlê û kuşt. Li gor agahiyan wî ji bo temirandina hesta namûsperestî û kevneperestane ya xwe serê Sumeyê jî li cendekê wê cuda kir.

Hêjayî gotinê ye ku Sumeye pêştir ji aliyê kurekê ku tevî de evîndarî kiribû, hatibû xwastin, lê bavê Sumeyê daxwaziya wî xortî qebûl nekiribû û Sumeye dabû kurekî din ku ne bi dilê wê bûye. Sumeyê jî xwe tevî evîndarê xwe dabû revandin. Piştê bi vê qedera nexweş û cinayeta hov re rû bi rû bû.

## Salane yek milyon kes bi sedema paqij nebûna xwezayê jiyana xwe ji dest didin

Li gorî rapora Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, salane bi qasî yek milyon kes li qareya Asya û Uqyanûsa Aram de bi sedema paqij nebûna hawîrdorê, jiyana xwe ji dest didin.

Li gorî rapora nûçegihaniya Xwendekarên Îranê (Îsna), nivîya wan kesên ku jiyana xwe ji dest didin, goriyê ava xwarinê ya pîs, pîs bûna hewa û hwd ... ne.

## Kargêrê Civata Muzîka bajarê Selmasê hate destbiser kirin

Berpirsiyarê Civata Muzîka bajarê Selmasê bi erêya dadgeha wenêrinê (tecdîdê nezer) ya parêzgeha Azerbaycana Rojava ji bo heyamê çar mehan tê destbiser kirin.

Ebas Nîkrewan Kargêrê Civata Muzîka Selmasê bi guneha xebatên cudayîxwaziyê, ji aliyê dadgehê ve bo heyamê çar mehan sûçbar kirin, lê ji ber ku Nîkrewan nerazîbûna xwe li hemberî wî hukmî nîşan dide, dosyeya wî diçe dadgeha wenêrinê, lê li wir jî car din ew hukme tê erê kirin.

Hêjayî gotinê ye ku sûçê ku Nîkrewan pê hatiye tawanbar kirin, tenê sazîkirina çend CD'ên bi zimanê Azerî ye.

## Jin zêdetir ji mêran tûşî Îdzê dibin



Xwandina lêkolînanên zanîngeha Karolînaya Başûr ya Amerîkayê eyan dike ku jin zêdetir ji mêran tûşî nexweşiya Îdzê dibin.

Li gor wan lêkolînanê ku li ser riftar û sîstema berevanî ya laşê wan hatiye kirin, jin û keçên 15 heta 24 saliyê, li gor mêmên hevtemenê xwe, zêdetir tûşî Îdzê dibin.

Ev lêkolîne ku li ser pitir ji 11 hezar kesan hatiye kirin, dide xuya kirin ku sîstema berevaniya laşê jinan di hemberî êrişê veyrosa HIV yê li gor mêran lawaztir e û ew yek dibe sedem ku jin zêdetir tûşî wê pîrsgirêkê bibin.

Herweha jin kêmtir ji mêran şîretên paqijiyê ji bo xwe parastin li hember tûşbûn bi HIV'yê bi cî tînin û di encam de egera tûşbûn bi HIV yê di wan de zêdetir dibe.

## Keça Pakistanî difin û lêvên xwe ji dest dan

Di Pakistanê de keçeke 19 salî ku ji dadgehê daxwaza veqetiyên (telaq)ê kiribû, ji aliyê mêmê xûşka xwe hat siza dan û lêv û difina wê jî hate birîn. Li gorî nûçevaniya Fars, Amine Ebas a 19 salî ku tevî birayê xwe ji dadgehê ve dizivirîn, kete ber êrişê mêmê xûşka xwe û lêv û difina wê hate birîn.

Eva di halekê de ye ku di salê de bi sedan jinên Pakistanî goriyên tund û tûjiya mêmên xwe dibin û canê xwe ji dest didin.

Jêder: irwomen.com

## Peyama Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ya Kurdistana Îranê bi hilkevta destpêka sala nû ya xwendinê

Sala nû ya hînbûnê pîroz be !

Xwendekarên birêz !

Azadîxwazên Îran û Kurdistanê !

Salekî nû bi xebat û tekoşina di rêya xwendin, zanist û hînbûnê dest pê kir. Salek li pêşberî me de ye ji bo ku astê zanîn, têgihîştin û şiyana xwendekaran bi cehd û xebata wan hê zêdetir geş dibe û her di vê rêyê de û bi hebûna wan civaka me dê hêdî hêdî ber bi civakekî pêşkevtî gavan avê. Li kêleka destpêbûna salekî din ji bo xwendin û hînbûnê, salekî din ji bo domandina xebata azadîxwaziyê di nava zanîngehan de dest pê bûye. Îsal bi hatine ser şola baskê turuhat perest, erkekî qurstir dikeve se milê xwendekarên azadîxwaz û gişt azadîxwazên welêt.

Yên ku heyanî niha piştî derbazbûna dehan salan bi ser hizra daxistî ya destpêka hatne ser şola Meleyan ve û piştî ev hemû hovîti, û xwînrêjiya dezgehên wan, niha bi awayekî ustalji ji rabihuriya xwe dinihêrin û dixwazin bi vê naverokê û têgihîştinê ku hene wergeranek ji vî serdemî re hebin, evên ku nîrê zordariya meleyan bi dest girtine û hem li warê piropagendeya tiruhatî û nezaniyê û hem li warê tepeserkirina azadî û azadîxwazan ve dikevin çepê dijberiya zanîngeh û navendên zanîn û serhildanê.

Xwendekarên Kurd!

Xelkê azadîxwazê Kurdistanê!

Hêsta termê bixwîne şehîdên 3'yê Reşemeya sala 1377an li ber çavê me wînda nebîbû ku havîna îsal baskê din yê rejîmê xwînmijên xwe yê di menbera Xumeynî de ra hatî, dişînin Kurdistanê ji bo xendiqandina dengê azadîxwazan.

Niho erkê ser milê xwendekarên Kurd e ku rêya şehîdên serhildana havîna 1384(2005) an bidomînin û bi bîrvexistina hevalên xwe yê desteser kirî, mil bi milê xwendin û hînbûnê, xebata demokrasîxwazî û azadîxwaziyê bidomînin û heya azadiya hevalên xwe yê bendkirî û heta gihîştina neteweya wan bi mafên xwe yê berheq û herweha heya avabûna demokrasîyê di Îranê de, ji bo demekê jî, ji xebata xwe newestin.

Xwendevanên Kurd!

Azadîxwaz û hev çeperên me !

Di sala nû ya xwendinê de, salek ku rejîma kevneperest û dijî azadîyê dixwaze desthilata xwe ya gemar û qirêj berfireh bike û weke dibêjin serî ji hemû kunên hizrî û civakî û siyasî bixe, di vê demê de ku rejîmê kîn ji neteweyên Îranê hil girtiye û xwîna azadîxwazan dirêje, erkê ser milê me ye ku ji bo xwerêxistin û ji hevcivîyanê, hêz û şiyana xwe bixin ser hev û mil bi milê çin û qatên din yê civakê, ji bo bidestveanina azadî û mafê neteweyê û rizgariya mirov ji desthilatê kevneparêzan, bixebitin.

Sala nû ya xwendinê ji we pîroz be

Serbikeve xebata azadîxwazane ya xwendekar û azadîxwazên Kurdistanê

Serkeve xebata neteweyî ya ntewenên Îranê

Cihgir be demokrasî di Îranê de

Desteya Rêveber ya Yekîtiya Xwendekarên

Demokrat ya Kurdistana Îranê

1384.07.03

2005.09.25



# Roman û Ewropa

Mîlan Kondera

Wergeran ji Farsî: Emîr Şuaivend (Beşa 4)

Ji mêj dem e ku pêşerojnêr, Sorealîst û Avangordîstan bi gelemperî li ser dawî hatina temenê romanê axivîne. Wan digot ku roman ji karwanê pêşkevtinê vemaye û dike ku di rêya pêşerojekî cuda û nû de gavan avê û ji vir pê de roman dê hunerek be ku tu wekhevîyek bi pêşeroja xwe ve nebe. Te digo qey roman jî weke xizanî, taxên serdest, tirumbêlên ji karketî û kilavên şapo ye ku di bin siya edaleta dîrokê de dê winda bibe.

Lê ger ku Servantes hîmdarê serdemê nû ye, divêt ku bi dawî hatina mîratê wî, serdemê nû jî bi dawî bihê. Lewra ev şîna ku hin kes ji bo romanê digêrin bê kakilin. Bê kakilin ji ber ku min mirina romanê dîtiye û ew ceribandîye. Ez şahid bûm ku di encama sansor, tengasî û givaşên îdeolojîk de, cîhana ku para girîng e jiyana min di wê de qetiya, cîhana ku carna bi cîhana totalîtarîzm tê xwendinê roman bi mergekî hovane ji nav bir. Lewra tu şikek nine ku roman ji nav çûye, herweke ku serdemê nûjen di Rojava de ji navçûyî ye. Roman weke mînaka serdemê nû ya Ewropa, û weke diyardeyekê ku li ser hîmên nediyar û rêjeyî yê pirsên mirovî hatiye avakirin, bi pêvajoya totalîtar re ne li rêye. Ev newekhevî û ne li rêyî yên han serî ji qelşekê hil dide ku dikeve di navbera neyarên rejîmên totalîtar û yek ji hîmdarên wê, yan jî dikeve navbera xebatkarên rêya mafê medenî yê mirovan û eşkenekerekê. Ji ber ku ev qelşa han serî ji pirsêki siyasî yan jî sincî hil nade, belkî ev newekhevîyekî hebûn nasî ye. Merema min eva ye ku cewhera cîhana ku li ser hîmên rastîyekî tak hatiye ava kirin, tevî cîhana nexuya û rêjeyî ya romanê ferqekî zaf heye. Rastiya totalîtarîstî rêjeya hebûnê şik û pirsyarê ji nav dibe. Lewre jî ew tu car nikare tevî eva ku min mezinahiya romanê binay kiriye di aştiyê de be.

Lê qey gelo di Rûsiya Kumonîstî de bi sedan hezar roman ev jî bi tîrajên berîn nahên weşandin û xwendin? Bê şik wilo ye. Lê çî yek ji wan romanên alîkariya gihîştin bi hebûnê [mirov] nakin. Tu parekî nû ji hebûnê nadin kifşê. Karê wan tenê erê kirina wan tiştan e yên ku pêştir hatine gotin. Tevî wê çendê jî bi erê kirina dubare ya tiştên ku hatine gotin (yan jî dubare kirina tiştên ku gereke bihên gotin), erkê xwe bi cî digehînin; bi vî rengî karê xwe bi civaka ku tê dde dijîn, peywend didin û xizmetekê dikin. Lê ji ber ku ev ne afirandin, di pêvajoya afirandinê ku bi raya min dîroka romanê xwediyê tu parekê ninin, ew xwe li wî sere dîrokê cih didin; yan jî em dikarin bibêjin romanên han vedigêrin bo serdemê piştî dawî hatina dîrokê.

Qasê 50 sal berî niha dîroka romanê li Rûsiyayê bi dawî hat. Wê bûyerê girîngîyekî taybet hebû. Ji ber ku romana Rûsî nîzîkî sedsalekê bala Ewropaiyan kişandibû ser xwe. Ku wisa bû mirina romanê tenê ne hizrek e; pêştir ew tişt li cihekê qewimiye, lwera jî em niha dizanin ku roman çawa dimire. Ew ji hole radibe, bigire ew jî çerxa dîroka xwe jî pal dikeve. Roman bi bédengî dimire û tu kes kêmtirîn bala xwe jî nade ser mirina wê.

8

Renge jî roman ji ber vaca xwe ya hundirî gehîştibe dawîya rê. Gelo romanê tim biyavên ku mirov dikare ji merifeta mirovî bifikire û hemû derfetên şewazî li şûn xwe de nehêstine?

Min bihîstîye hin kes romanê dişibînin bi kanên rejûya kevir ku rejû têde nemabe. Lê ji boy min ev çende pêtir weke goristana derfetên ji dest çûyî û tevgerên nediyar dixuye.

Bi giştî çar cure tevger di mêjiyê min de hene:

## 1- Tevgera listinê

Bi hizra min **Tirîstam Şandî** berhemê Stern û **Jakê Dawer** berhemê Dîdro, ji mezintirîn romanên sedsala 18'an in ev du roman di astekî pir hêja de henekên xwe dikin û di micit nebûnê de jî digehin qasê xwe yê herî bilind ku heya îro jî tu kes ne heya

wê rojê û ne heya roja îro jî negihîştîye wî qasî. Piştî wê dîrokê, romanê dest û pêyên xwe di zincîrekê ku dixuya rastîyekê û etmosfera rastî û berdeamiya tekûziya demê de qeyd kir û ev biyava berfireh ya ku wan du mamostayan berhev kiribû li şûn hêst û ger ku ev di wan biyavan de berdeyam ban, romanê hê baştir bimehîba (wisaye, mirov dikare dîrokekî din ji bo romanê raxe ber çavan ...).

## 2- Tevgera xewn û xeyalê

Kafka di sedsala 20'an de ji nişka ve lawazî û sistiya romana sedsala 19'an têkşikand û gehiştê ew tiştê ku paşan sorealîst tim di şopa wê de bûn, lê tu car ne gehîştinê de, ango hevalandina xeyal û rastîyê. Di rastî de jî, ji mêj dem ve armanca bédawî nasîna romanê her ev hevalandine bû. Di serdemê Novalis de jî îşare bi vê pirsê dihat kirin, lê ji bo gihîştin bi wê armançê kîmiyageriyek pêwîst bû ku di vê rêyê de jî tenê Kafka karî sirra wê bide kifşê. Pişka mezin ya kafka nabe tenê weke gavekî dawîn di pêvajoya veguherîna dîrokê de bihê zanîn, belkî divêt ev pêtir weke kevneşop şikênîyekî çavnehêr nekirî bihê zanîn ku bi hebûna wê roman dikarî fi cihekê bihê dîtin ku li wir, xeyal weke xewê bifirya û roman jî dikarî **tiştêki din** bûya.

## 3- Tevgera hizrê

Her ji serdemê Servantes ve romanê tim xwestiye romanên felsefî bi xwe ve bigire. Di berhemên Mozîl û Birax de ev heza han derfeta kemilînê peyda kir. Ger mirov karibe romanê **Geriyaneke di hebûnê** de bizane, wî çaxî wateya bi xwe girtina romanên felsefî jî ronî dide. Karê romanê ne kemilîndina **zanist** û nivîsîna **dîroka pir alî** ye; karê romanê mifah wergirtin ji hemû wan alavan e ku çê dibe di hîmên [vac] xwaziya romanê de cih bigirin û bi alîkariya wan hebûna mirov ya eşê bihê ronî kirin. Guherîna romanê bi diyardenasiyekî romansî û berhev kirina alavên hunerî yên pêwîst ji bo wan guhertinên, erkeki gelek mezin û giran e. di vî warî de destkevtên ew du romannivîsên Viyenî ango Mozîl û Birax, herçiqas gelekî seyr bûn, lê ew gava yekem di rêyekî gelek dirêj de ne.

## 4- Tevgera demê

Serdemê newekhevîyên heta hetayî dike ku romannivîs, berteskiyên pirostî di biyava tîfîkrîna di çarçoveya demê de (ku di serpêhatiyên takekesî de diqetiyên) li şûn bihêlin û pirsê berîntir bibînin û kêşeya dema gelemper û dema Ewropî bi cihê tîfîkrînê zanbin; ango kêşeya Ewropî ku bi barihuriya xwe vedinihêre û weke kalekê ku temenê xwe yê herikî bi bişrînekî demlîdest ji ber çavê xwe diajo, dîroka xwe sivik û giran dike. Şik û wesweseya ku Guntergras û Karlos Foentos ji wê rind haydarin, her ji vê tevgera demê re serî hildane: ew dixwazin roman li ser berteskiyên kevneşopî [yên demî] ku bi hebûna wan dem di çarçoveya jiyaneke de dimîne, baz bide û di hember de bikare, di berhemekî tak de, çend daweriyên dîrokî di xwe de bigre. Di rastî de jî guhartinên han dikarin veguhartinên mezin di rûmetê romanê de pêk bînin.

## 1. "Ontologie"

# BIRATÎ

ADAR JIYAN  
[adarjiyan@myynet.com](mailto:adarjiyan@myynet.com)

Biratî, têngînek malbatî û civakî ye. Malbat, bi dawîbûna civaka hoveber(seretayî)re derketiye holê. Bi civaka çîndar a kolmend re pêşve çûye û di civaka derebegî(feodal) de kemiliye. Têngî û pêwendiya biratiyê di dem û serdemên kevnar ên dîrokî de ango bi pergala kolemandiyê re gihîştîye asta dawîn.

Biratî, ji têngîyên malbatî wêdetir, bi bîr, bawerî û ramana civakê re guheriye. Hin bi hin ji wateya xwe ya rastîn û resen bi dûr ketiye û li wateyê xaze û pêwendî dageriyaye.


Civakîbûna mirov, rasterê girêdayî amraz û pêwendiyên hilberiyê dişêwe û dikemile. Di wateyê teng de an jî li gorî kan û jêderka peyvê, kesên ku dê û bavê wan yek be, wekî bira têne pejirandin. Belê her civakê, têngîha biratiyê li gorî wateyê xaze bi nav dike. Û her wiha li gorî hest, raman û baweriya xwe rave û şîrove dike. Ango biratî, her çendî pêgirêdaneke malbatî be jî bi bîr û bawerî û pêwendiyên civakî re diguhere û wekî têngîheke guherbar li gelek wate û navandinên din dadigere.

Biratî, li gorî feraseta olî (nemaze jî îslamî), kesên ku ji heman umetê ne û bîr bawerî bi heman olê anîbe, wekî bira têne qebûlîkin. Pêxemberê Ola Îslamê, Hezretê Mihemmed gotiye: "Ancax xesên bawermend bira ne" Û xizm û lêzimên ku baweriya wan bi ola îslamê nîn bûye, ew wekî dijmin û neyarên xwe û umeta xwe dîtiye û pejirandiye. Ligel ku gelek eqrebeyên wî yên nêzîk, alîkariya wî kirine jî, wan ew nêzîkî xwe netîtiye û têngîyê xwe ji wan qut kiriye.

Heman tişt ji bo gelek olên semawî yên yek xwedayî jî derbas dibe. Ji xwe di mûsewîtiyê(ola Mûsa Pêxember) ango di cihûtiya îroyîn de, ji bilî mirovên ku bi ola Mûsa bawerî neanîne, tu mirov wekî mirovên qenc nehatine hesibandin û bira nehatine hebandin. Li gorî baweriya cihûyan: "Cihû(mûsewî), qewmekî pîroz in û ji hêla yezdanê dilovan ve wekî pîrozwer hatine xuliqandin." Her wisan, dîsa li gorî rêzik û qaydeyên cihûtiyê, çendî ku bixwazin jî "Tu mirov nikarin bibin cihû û tu cihû jî nikarin bibin bawermendên oleke din." Lewre, li gorî baweriya wan, qewmîtiya wan bi ola wan re û ola wan jî bi qewmîtiya wan re pêk hatiye. Her du ji hevdu nabin û pevkelijîne ... Ji bo wê, biratiya olî, biratiyê ku bi baweriyê ve girêdayî ye.

Wekî din jî biratî, di navbera kesên ku fikr û ramana wan diçe ser hev an pevre têngîneke hevpar dikudînin de jî pêk tê. Yanê kesên ku konetî û ramariya wan yek be jî heman ferasetê diparêzin. Bo nimûne kesên welatperwer, mirovên welatperwer; kesên nîjadperest, mirovên nîjadperest, kesên şoreşger jî mirovên şoreşger nêzîkî xwe dibînin û wan ji bo xwe wekî bira dihesibînin. Mirov dikare vê biratiyê ji bo kesên ku hesinê wan bi serê hevdu de diçe û gelek tiştên xwe pevra parve dikin jî di vê kategoriyê de bibîne.

Biratiya civakî ji biratiya xwînî (yên ku dê û bavê wan yek e)



pêşketîr,  
 erênîtir û  
 sûdwartir e.  
 Belê biratiya  
 herî mezin  
 biratiya ku  
 tevê mirovên  
 dinê; ol,


nîjad, netewe, zayend û bîr û baweriya wan çî dibe bila bibe, tevan himbêz dike, biratiya herî rastîn e. Û ev biratî tu carî têng naçe. Û ev biratî, li ser himê rastî û duristiya ava dibe û bi vî û vîndariya mirov misoger dibe. Lewre tu biratî bi lêdan û kotekê darê zorê pêk nayê û nameşe. Biratiya ku ji neçarî û bê vîna mirov pêk tê, biratiya xwînî ye. Û ev biratî jî, biratiyê teng û tixûbdar e. Di pêwendiya biratiyê wisa de, zêde sûd û fêdeyên civakî û gerdûnî pêk nayên. Zêdetir di dema êl û eşîrtiyê de û di domana bavik û ezbetiyê de bi kêrî mirov tê. Ew jî dibe sedema kerb, kîn, şer û pevçûnên navxweyî û aloziyên rojane.

Di mercên îroyîn de biratiya herî çê, biratiya gerdûnî ye. Û biratiya gerdûnî, tu carî ji serdest, stembar û desthilatdarên din pêk nehatiye. Ew, di navbera gelan de, nemaze jî gel û civaêkn bindest de pêk tê û geş dibe. Û biratiya rastîn, domdar û bêdeman, biratiya gelan e. Belê ew gelên ku şert û mercên biratiyê diafirînin û pêkêşî hemû mirovên cûhanê dikdin, dikarin biratiyê gerdûnî pêk bînin. Ne yên ku gelan tune dihesibînin û xwe di ser her gel û civakê re dibînin na.

Carekê tu biratî jî bi lêdan, kotek û darê zorê nameşe. Gava ku mercên biratiyê bêne danîn, tu kes ji têngîyên biratiyê nareve. Lewre di biratiyê de hevparî, yeksanî û alîkarî heye. Û ev hevkarî û alîkarî bi destê mirov pêk tê.

# XAÇEPIRS

A: Emîr Şualwend



## Çeprast:

- 1- Reben
- 2- Navê Gorbaçof yê biçûk
- 3- Eşîr - Demsal - Ne ku ne
- 4- Xweşik û jêhatî - Yek li ser duda - Dengê kevê
- 5- Şêr bi Erebi - Dewş
- 6- Sedsal - Navekî Kurdî
- 7- Ew û Ceh heval in - Jî bi Farsî
- 8- Dest bi Turkî - Ava wê di vexwarinên elkulî de tê bi kar anîn
- 9- Nahê doşîn - Dengê çêlekê
- 10- Bajarekî Kurdistanê - Lewz

## Serjêr:

- 1- Kar - Bi xwestekên xwe gihîştî
- 2- Qonaxek ji xwandina bilind - Şil û xav
- 3- Ez û tu - Rengek e - Hizr û rey
- 4- Qeza û Nahiye - Xewn bi Îngilîzî
- 5- Bi Erebi taybet
- 6- Nerêk
- 7- Kakila wê girover û bi rûn e - Heqdan
- 8- Perçem - Qêrîn - Min û te
- 9- Birayê nokê yê neheq - Zêdexwazî
- 10- Belê - Heta çavan negirî wê nabînî

## Cihana Muzîkê


## Koma Muzîka Kamkaran di Festîvala Muzêkê ya Cîhanî de



Koma Muzîkvanên Kurd, **Kamkaran** bo cara duyemîn bi awayekî fermî ji bo Festîvala bi nav û deng ya Muzîka Cîhanê hate vexwendin.

Ev Festîvale di meha yekem ya sala 2006'an li Madrid, Paytexta Îspanyayê tê lidarxistin.

Di vê Festîvala mezin ya muzîka cîhanê de çend konserên mezin bi boneya du sed û pêncemîn salvegera ji dayik bûna **Motsart** dê pêk bihên û Koma Kamkaran wekî dengê huner û muzîka Kurdî beşdariyê dike.



### Malpera Komîteya PDK Îranê ya Amerika vebû

Malpera Komîteya Amerika ya PDK Îranê dest bi xebatên ragihandinê li ser internêtê kir.

Navnîşan:

<http://www.kurdmedia.us/>






## Behmen Qubadî li Îranê namîne

**Agiri-** Li gorî daxuyaniya Heftînameya Sîrawanê çapa Sine, Behmen Qubadî derhênerê navdar yê Kurd, Kompaniya Fîlm çêkirina xwe "Mij Film"ê li Tehranê daxist û da xuya kirin ku bo nîşandana nerazibûna xwe ji ne girîngîdana berpirsiyarên sînemaya Îranê, çî din xebatên fîlm çêkirinê li Îranê nadomîne.

Qubadî got: ne girîngîdana berpirsiyarên sînemayî bi filman ji qonaxa nivîsandinê heta çaxê



nimayîşkirin û belavkirinê bû sebeb ku ez êdî xebatên xwe yên Fîlm çêkirinê li Îranê nedomînin.

Behmen Qubadî berî niha bi sedema nimayîşkirina nebaş ya filma **Kusî ji dikarin bifirin** da zanîn ku êdî di Îranê de filma na çêket. Wî bi vê Fîlmê karî gelek xelatan bidest bixe û firotina wê di asta navneteweyî de serkevtî be.

Li gor gotina Qubadî, televîzyona Îranê bi awayekî fermî îlan kiriye ku fîlmên wî bo belav kirinê nabin.

Wî herwiha Wezaretê Çandê ya Komara Îslamî ya Îranê ji ber nedana izna navneteweyî ji bo Kompaniya Mij Fîlmê rexne kir û got ku izna xebata navneteweyî ji bîroya min re nehate dayîn, eva di halekê de ye li derveyî welat televîzyonên welatên din, him filman dixwazin û him izna xebatê û çêkirina filman didin.

Renge Behmen Qubadî xebatên biro û fîlm çêkirina xwe li Londonê bidomîne.

## Berga sêyema ya "Pêkhate û Raveyî Deq" derket

Berga Sêyemî ya pirtûka "**Pêkhate û Raveyî Deq**", wergerandina birêz Mesûd Babayî bo ser Kurdiya Soranî hate çap û belav kirin. Ev pirtûka bi pênuşê Babek Ehmedî bi Farsî hatiye nivîsandinê.

Hêjayî gotinê ye ku hêj parek ji Pirtûkê di destê wergerandinê de ye ku di berga çaran de dê bikeve ber destê xwendevaên xwe.

**Desteya Nivîskar ya Agiri** seba derketina berga sêyemî ya vê pirtûkê pîrozbahiyê ji wergerê Kurdî



yê pirtûkê, Kekê Mesûd Babayî dîke û jê re hêviya serkevtinê pitir dixwaze.

## Di xema wexera dawiyê ya Merziye Ferîqî de

Sibêdiya roja yekşemê, 18.09.2005'an hunermenda dengxweş ya Kurd û stêrka huner û muzîka Kurdistanê, Merziye Ferîqî li Stokholma paytexta Swêdê çavên xwe li jiyane girtin û bo heta heta xatira ji jiyane xwast û cihê bilind yê xwe di qada huner û muzîka Kurdî vala kir.

Xeberê xemgîn yê koça Jine hunermenda Kurd Merziyê dilê hemû neteweya Kurd xembar û teji kul û kovan kir.

Her çiqas wê xatira xwe ya yekcarî ji jiyane xwast, lê dengê xweş û zelal yê Merziya nemir û awazên wê yên ber dilê evînadarên huner û muzîka Kurdî her dem bi cîhana huner û muzîka Kurdî re ne.

Merziya stranbêj û azadîxwaza di 18.05.1958'an de li bajarê Merîwana Kurdistanê Îranê hate dinê.

Mirina bêwext ya Merziyê civaka Kurd kire xwediyê xemeke giran.



### Desteya Nivîskar ya Agiri

behî û serxweşiya xwe pêşkêşî malbata wê hunermenda dengxweş û nemaze hevjinê wê birêz Nasir Rezazî, hunermendê navdar yê muzîk û strana Kurdî dîke.

Riha wê şa be û rêya Merziya hunermend teji rêving be.

## Rakirina xwendina bi zimanê Kurdî di Zanîngeha Kurdistanê de

Rejîma Komara Îslamî ya Îranê ku di sala çûyî de şaxa xwendina bi zimanê Kurdî li Zanîngeha Kurdistanê de danîbû, bi vê hêcetê berdeyam jêre propaganda dikir. Niha ew maf ji xwendekaran standiye û xwendina bi zimanê Kurdî ji bernameya Zanîngeha Kurdistanê (Sine) hatiye rakirin.

Eva di demekê de ye ku gelek xwendekaran îsal di "Kunkor" (ezmûna çûn bo zanîngehê)ê ew şaxa xwendinê ji xwe re hilbijartiye.

Hêjayî gotinê ye ku xwendin û nivîsîn bi zimanê Kurdî di xwendîngeh û zanîngehan li Kurdistanê Îranê de ji aliyê rayedarên Komara Îslamî ya Îranê hatiye qedexe kirin.